# Dostê Kurdan Václav Havel çû rehmetê

Dostê Kurdan yê hêja, siyasetvanê navnetewî û serokomarê berê yê Komara Çekê Václav Havel piştî duhî rakirin nexweşxanê û mudaxeleyî tibî pêk anîn, ji xewa şêrîn ranebû û ji nav me barkir, çû rehmetê.

Havel di 1936 an de li Pragê hatibû dinyê. Bi lîstikên şanoyî jî tê nasîn. Naveroka şanoyên wî giraniya xwe li ser normên exlaqî bûn. Lîstikên herî naskirî ”Melekê Parastinê” û ”Şahiya li Bexçe” ye.

Havel, Serokomartiya Komara Çekê (1993-03) kiribû. Ji bo demokrasî û parastina mafê mirovan li Çekoslovakyayê bi hereketa Charta 77 an, di gel doktorê Kurd yê nasdar Yekta Uzunoglu re xebitî bû. Ji ber xebatên xwe yên însanî hejmarek xelat girtibû.

Em bi çûna wî xemgîn in, xemgîniya malbata wî par dikin. Ew dê dilê gelê kurd de bijî.

**EuroKurd Human Rights - www-eurokurd.net**